DI TARIYA ÇAVÊN ŞEVÊ DE

Cihan Roj

Te zemîna çemeke av lê miçiqî bi bîr anî?
Başe, aniha ruhê min li ber çavê te ye!
Aniha, di kolanên bihecok de,
Ez, bi dengan şad nabim
Kî dixwaze xwenên xwe bifiroşe,
Lê jixw
Di paşila herkesi de xwen hene..
Min bêriya miriyekê kiriye
Ji min wetir ew min dihewîne
Di van şevreşkên ku dişibin qehpikên
Benişt di dev de
Bila stranan bibêjin
Yên, aniha li her deverî zarokên xwe dihejînin
Bila mirî bi ken bin
Gula beroj heya berbangê bêhn vede
Ji xeynî min kes deriyê tariyê
Yê dadyî nebîne

Em ji çîrokên bûne xwelî de tên
Ne felç li mirinê dide
Ne jî bi gopal digere mirin
Ey ṣeva bûye gundek wêrankirî
 Tu îṣev li min bûyî
Çûçikên siltan Suleyman û Feqiyê Teyran
De tu baskokî birîndar bimîne li ser milên min
Bi newaya qîrînên kerbela,
Tu bi ya dilê min
Ta kengî diherikî
Em ji çîrokên bûne xwelî de tên der-dêm!
Dîroka me hineya kevirane
Tifû dikin em pêṣî
Dû re, bi rengê li destê xwe ṣad di-bin!
Bêyî ku metelmayî bimînim

Ne ku dikenim
Nagirîm
Bi qasî spîndara çile matesare (Jiyan).m..
(Di ṣibakeyekê de)
Ew reng im.
Ku ji bedena mirî
Ya dergûṣek de dizanim..
Stranekê ṣiyar dikim ji xewa sibehê:
Hez dikim ji stranan
Nexwazim xwe veṣelînim
Û bikevim nav nivînan
Ez, aniha, bi vî halî
 Li bask û birînên peyvan temaṣevanim
rengê roja berêvaran
Xwe di ruyê min de daye der..